WANEYÊN FÊRBÛNA ZIMANÊ KURDÎ

(Asta yekemîn)

AMADEKAR : TEMOZ ŞEMALÎ

Rêzepirtûkên Saziya Zimanê Kurdî
li Rojavayê Kurdistanê (SZK – Rojava) -1-

Ez vê pirtûkê diyarî

hêja Narîn dikim, tev silavine

xweş ta dawiya jiyanê û hêviya

Fêrbûneke li asteyeke herî bilind

Temoz Semalî

9-7-2010

Waneyên Fêrbûna

Zimanê Kurdî

(Asta yekemîn)

Amadekar: Temoz Şemaîl

RÊZEPIRTÛKÊN
Saziya Zimanê Kurdî li Rojavayê Kurdistanê
SZK - Rojava
(1)

Navê pirtûkê: Waneyên Fêrbûna Zimanê Kurdî (Asta yekemîn)
Amadekar: Temoz Şemalî
Ji weşanên: SZK - Rojava
Rêzepirtûkên SZK - Rojava
Hejmara (1)
Çapa yekemîn: Nîsan - 2008
Çapxana Saziya Ragihandina KCK-Rojava

ÇEND GOTIN LI SER PIRTÛKÊ

(Li Şûna Pêşgotinê)

Ev pirtûk ji bo naskirin û fêmkirina bingeha zimanê kurdî ji aliyê rêziman ve, hatiye amadekirin. Ji bo xwendevanên ku nû fêrî zimanê kurdî dibin, wek materyaleke (mînhec) refa yekê hatiye berhevkirin.

Herwiha ev pirtûka rêzimana refa yekê ji aliyê Mamoste Tamoz Şemalî ve di nava demeke kurt de, ji bo bersivdayîna pêdiviya vê materyalê hate amadekirin. Li Sûriyê (Rojavayê Welat) pêdiviya materyalên bi vî rengî hê jî heye û lewre ji ber vê xebatê giranbuha em hêvî dikin şagirtên zimanê kurdî bi pêwendîdariyeke mezin bersiveke watedar bidin. Ji bo rakirina astengiyên li hemberî zimanê kurdî, xebateke bi rûmet e.

Ji bo perwerdeyên ku ji aliyê Saziya Zimanê Kurdî li Rojavayê Kurdistanê (SZK-Rojava) dihate meşandin ez bawer dikim ku wê ev pirtûk bibe alîkareke mezin.

Amadekirina vê pirtûkê di bin mercên giran de û bi lezbûneke awarte pêk hat. Lê li gorî derfetên heyî wek xebateke bingehîn, mirov dikare ji bo perwerdeyên refa yekê bi kar bîne û gelek sûdê jê werbigre. Ez hêvî dikim ku xebatên bi vî rengî li Sûriyê zêdetir bibin û di serî de Mamoste Temoz Şemalî xebatên xwe yên bi vî rengî berferehtir bike, bidomîne.

Bi mebesta vê pirtûkê em serkeftin û berdewamiya xebatên Mamoste Tamoz Şemalî hêvî dikin.

Bêrîtan Lêlîkan

Ji weşanên SZK-Rojava

Rêziman

Pênase (pênasîn-danasîn): Rêz û rêçikên rastiy
xwendin, nivîsandin û axaftina zimanekî şanî mirov dike

(Waneya Yekê)

Hêmanên Zimên

Pênase: Di her zimanekî de, hêmanên zimên deng in, ji her dengekî re jî, zimanzanan durvek çêkirine, ji wan re dibêjin tîp.

Di zimanê kurdî de jî, sî û şeş dengên bingehîn hene, lê bi sî û yek tîpên sereke, ji me re nîşan dane.

Ji tîpan kît ava dibin û ji kîtan bêje û ji bêjeyan hevok, ew jî, bi xwe hêmanên zimên in.

Hêmanên zimên çar in:

1- Tîp:

Di zimanê kurdî de, sî û yek tîpên bingehîn hene.

Nimûne (Mînak):

a - b - c - ç - d - e - ê - f - g...

2- Kît (kite):

Kît, bi derbekê re, ji devê mirov der tê, dibe ku kît ji tîpekê ta pênc tîpan pêk bê.

Nimûne:

"Gerîla" Ji sê kîtan saz bûye: Ge + rî+ la

3- Peyv:

Ew tiştê ku ji kîteyekê an ji çend kîteyan pêk tê û xwediyê wateyekê ye.

Nimûne:

Gul, Serok, Kurdistan, ...

4- Hevok (komek):

Li gorî rêz û rêçikên ziman, rêzbûna çend peyvan li pey hev ku wate an daxwazekê bi mirov dide zanîn.

Nimûne:

Welatê me bindest e.

Ji azadiyê bihatir tuştek nîne.

(Waneya Dudiyan)

Alfabêya Kurdî
(Abêcêya Kurdî)

Pênase (danasîn): Ew dengên ku di axaftinê de, ji devê mirov dertên û bi tîpan tên nîşankirin, ango mirov bi riya tîpan dikare dengan nîşan bide. Hemû tîpên ku di zimanekî de hene jê re alfabê tê gotin.

Tîp:

Pênase: Nîşaneyên dengên ku ji devê mirov dertên in.

Di zimanê kurdî de sî û yek tîpên bingehîn û pevdengek hene, lewre em dibêjin alfabêya kurdî (kurmanciya jorîn) ji sî û yek tîpan pêk tê.

Tîpên kurdî bi du cureyan tên nivîsandin: Biçûk û mezin (hûr û girs). Ji tîpên biçûk re hûrek û ji yên mezin re girdek tê gotin.

Tîpên girdek ev in:

"A - B - C - Ç - D - E - Ê - F - G - H - I - Î - J - K - L - M - N - O - P - Q - R - S - Ş - T - U - Û - V - W - X - Y - Z".

Tîpên hûrek ev in:

"a - b - c - ç - d - e - ê - f - g - h - i - î - j - k - l - m - n - o - p - q - r - s - ş - t - u - û - v - w - x - y - z".

Dengdariya tîpan (dengdayîna tîpan):

Tîp ji aliyê dengdariyê ve, li ser du koman dabeş dibî Dengdêr û dengdar.

(1)- Tîpên Dengdêr:

Ew tîpên ku bi serê xwe û bê astengî ji devê mi dertên.

Dengdêrên zimanê kurdî heşt in, sisê ji wan deng û pênc jî, dengdirêj in.

Tîpên dengdêr ev in:

A - E - Ê - I - Î - O - U - Û.

Bilêvkirina dengdêran di bêjeyan de:

A: Apo, Azadî, Çira...
E: Em, Welat, Perwerde...
Ê: Êriş, Bêrîvan, Mê...
I: Rizgar, Sibeh, Jin...
Î: Îşev, Şehîd, Partî...
O: Ol, Şoreş, Qamişlo...
U: Kurd, Buhar, Bihuşt...
Û: Dûr, Tembûr, Xwesû...

Dengdêrên dirêj:

A - Ê - Î - O - Û.

Dengdêrên kin (kurt):

I - E - U.

Li gorî asta derketina dengdêran ji devê mirov:

Tîpên dengdêr bi sê asteyan ji devê mirov dertên:

A - Çar tîp bi asteya bilind ji dev dertên:

i - î - u - û.

B – Tenê tîpek bi asteya navînî ji dev dertê:
ê.

C – Sê tîp jî, bi asteya nizim ji dev dertên:
a – o – e.

Li gorî awayê vebûna devê mirov:

Bi sê awayan tîp ji devê mirov dertên:

A – Bi awayê giloverbûna dev, sê tîp in:
o – u – û.

B – Bi awayê nîv girtina dev, sê tîp in:
î – ı – ê.

C – Bi awayê vekirina dev jî, du tîp in:
a – e.

Li gorî cîderketina dengdêran:

Tîpên dengdêr ji sê ciyan ji devê mirov dertên:

A – Pêşderkî: Du tîp in:
î – ê.

B – Navderkî: Du tîp in:
i – u.

C – Paşderkî: Çar tîp in:
û – o – e – a.

(Waneya Sisiyàn)

Taybetmendiya Tîpên Dengdêr

1- Tîpa 'A' û 'O':

Li ser herdu tîpan tu tiştê girîng nîne ku yek li ser raweste, bi gelempèrî ev herdu tîp di heman ciyên bêjeyê de tên.

2- Tîpa 'E':

Hin caran ev herdu tîp 'E' û 'I' bi hev têne guhertin. Nimûne:

Merov = Mirov,
Çel = Çil,
Fere = fire.

Gava di bêjeyekê de tîpa "ê" an "a" li pey tîpa "e" werin, wê gavê tîpa "e" ji bêjeyê dikeve, an tîpa girêkok "y" dikeve navbera wan.

Nimûne:

Perde + a = Perdeya oda (jur) min rengîn e.
Perde + a = Perda oda min rengîn e.
Mase + a =Maseya oda min kevnar e.
Mase + a =Masa oda min kevnar e.

Gava di bêjeyekê de tîpa 'e' dubare bibe, tîpeke girêkok dikeve navbera herdu 'e' yan, an jî herdu 'e' bi yek ji van tîpan tên guhertin: a, e, ê.

Nimûne:

Perde + ek =perdeyek = perdek = perdak = perdêk.
Perçe + ek =perçeyek = perçek = perçak = perçêk.

3-Tîpa 'Ê':

Tîpa 'Ê' di bêjeyekê de, li pêşiya tîpa dengdar 'y' nayê (netê), ger bi awakî ew tîpa hat jî, wê gavê bi tîpa 'i' tê guhertin.

Nimûne:

Rê + ya: Riya azadiya gelên bindest dijwar e.
Dê + ya: Welat diya min e.

4- Tîpa 'I':

Ji bilî hin daçek û cînavkan (li, bi, di, ji, çi) ev tîp ne li despêk, ne jî li dawiya bêjeyê tê. Ew bêjeyên ku 'i' di despêkê de tê, bêjeyên biyanî ne ku derbasî nav zimanê me bûne. Nemaze (Taybetî) ji zimanê Erebî hatine.
Nimûne:

Inkar, işaret, izin, imze.

Lê hin caran tîpa 'i' ji bêjeyan dikeve, gava parkîtek (tewang, veqetandek (zêder) an pirtikên nependiyê) bi bêjeyên ku bi kîta 'i' bi dawî bibe, ji ber ku 'i' netê bilêv kirin, netê nivîsandin.
Nimûne:

Bizin:	bizna sor, lingê biznê.
Kevir:	kevrê mezin.
Dagir:	peyalê dagre, 'Ji hestên tozgirtî evîna min dagre.'

Hinek zimanzan dibêjin: 'i' di rewşa jorîn de divê bê nivîsandin, tevî ku nayê xwendin. Lê di baweriya min de, ger bê nivîsandin rêzika sereke (Çawa tê xwendin wisa tê nivîsandin) tê şikandin, lewre ez dibînim bi awayê di latika (xanxanik, xişte) jêrîn de hatiye çewt e.

Nimûne:

Resena bêjeyê	Nivîsandin	Xwendin
Bêhin + ok	Bêhinok	Bêhnok
Dagir + e	Dagire	Dagre
Tevin + e	Tevinepîrk	Tevnepîrk

Lê ger 'i' di bêjeyên hevedudanî de hate xwendin, divê bê nivîsandin.

Nimûne:

Kevinperest, xatirxwastin, pirbezandin, ...

Têbîn: Tîpa 'i' di navbera tîpên dengdar 's' û 'p', 's' û 't' de nayê nivîsandin.

Nimûne:

Spas, spartin, spî.

Star, stran, standin.

5- Tîpa 'Î':

Di kurmancî de, ev tîp di yekbêjeyê de, berî tîpa 'Y' netê, ger bi awakî hat, dengê xwe kin dike û bi tîpa 'i' tê guhertin.

Nimûne:

Rastî: Rastiya dîrokê nayê veşartin.

Kanî: Kaniya gundê me dirêjiya salê diherike.

Partî: Partiya Yekîtiya Demoqratîk.

Têbîn: Weke ku derbas dibe, tîpa (î) di rewşa jorîn de, guherîna xwe bi tîpa dengdêr (i) yê xuya dike, pirtirî ku xuya bike ku (î) berî tîpa (y) ê nayê.

6- Tîpa 'U':

- Ev tîp li pêşî 'û' paşiya bêjeyan nayê. Celadet Bedirxan li ser vê tîpê dibêje ku di bingeha xwe de, ji van du tîpan 'wi' pêk hatiye.

Nimûne:

Xwirt =xurt,
xwiya = xuya,
xwirandin = xurandin.

- Ev tîp berî tîpa 'w' nayê (netê), ger bi awayekî hat jî, bi tîpa 'i' tê guhertin.

Nimûne:

'Du' (2) di rewşa gelejmar de (duwan = diwan):
Her diwan li çiyayê Gebarê şer kirin.

- Ev tîp bi giranî li paşiya dengdarên 'g - h - k - q - x' tê.

Nimûne:

Gu, guneh, hundir, hunda, kurdistan,
kum, qul, qurç, xult, xunav.

7- Tîpa 'Û':

Ev tîp tu carî di bêjeyekê de, li pêşiya tîpa 'w' nayê (netê), ger hat jî, bi tîpa 'i' tê guhertin.

Nimûne:

Dû:	Diwê vî agirî gelekî bilind dibe.
Rû:	Riwê Delalê çi xweşike.
Xwesû:	Xwesiwa birayê min delal e.

(Waneya Çaran)

(2) - Tîpên Dengdar:

Pênase: Ew tîpên ku bê alîkariya dengdêrekê, ji devê mirov dernetên (dernayên) û dengekî nadin. Di kurmancî de, bîst û sê tîpên dengdar hene, ew jî ev in:

B - C - Ç - D - F - G - H - J - K - L - M - N - P - Q - R - S - Ş - T - V - W - X - Y - Z.

Cîderketina tîpên dengdar:

Dengdar ji çend ciyan ji devê mirov dertên û ji hev cuda dibin. Hinek ji lêvan, hinek ji diranan û hinek jî, ji gerîna zimên di dev de, dertên.

A- Lêvkî:

b - m - p - w.

Nimûne:

B: Bêrîtan - Xebat - Milêb.
M: Mizgîn - Mehebad - Mezlom.
P: Parêzer - Apo - Payîz.
W: Welat - pêwist - gelawêj.

Têbîn (têbînî): Ev herdu tîp 'B - O' di zimanê kurmancî de, gelekî hindik li dawiya bêjeyan tên.

Nimûne:

Milêb - Celeb - Tibab.
Wilo - Ko.

Têbîn: Her sê tîp 'B - M - P' bi hevgihiştina herdu lêvan dertên, tenê tîpa 'w' herdu lêv nagihin hevdu.

B- Diranê Kî:

Bi tevgera ziman an bi guvaştina ziman ser herdu diranan (diranên jor û diranên jêr) dertên, ew jî, heft tîp in:

t - d - s - z - r - l - n.

Nimûne:

T: Tekoşîn - Stran - Xebat.
D: Delal - Zîndan - Zend.
S: Serdar - Desmal - Teles.
Z: Zîlan - Zîz - Lez.
R: Raperîn - Şoreş - Rizgar.
L: Leheng - Serhildan - Mal.
N: Newroz - Xunav - Zivistan.

C- Diranlêvkî:

Ev tîp bi guvaştina diranên jorîn û lêva jêrîn ser hevdu dertên, ew jî tenê du tîp in:

f - v.

Nimûne:

F: Ferhad - serfiraz - maf.
V: Viyan - Evdîn - lêv.

Ç- Pêşezimanî:

Ev tîp ji pêşiya zimanê mirov, bi girtina herdu diranan dertên, ew jî, çar tîp in:

c - ç - j - ş - y.

Nimûne:

C: Ceng - Dîcle - Pênc.
Ç: Çav - Kilçîv - Xaç.
J: Jiyan - Nijad - Roj.
Ş: Şîlan - Îşev - Şaş.
Y: Yekda - Beylan - Mey.

Têbîn: Tenê tîpa 'Y', bi hevgihîştina ziman û diranên jêrîn re dertê.

D- Ezmandevî:

Ev tîp ji ezmanê devê mirov dertên, ew jî sê tîp in:
g - k - x.

Nimûne:

G: Gerîla - Hogir - Reng.
K: Karker - Têkoşîn - Kîvroşk.
X: Xebat - Cegerxwîn - Tebax.

E- Qirikî:

Tenê du tîp ji qirika mirov dertên:
h - q.

Nimûne:

H: Herekol - Guhdan - Nuh.
Q: Qehreman - Teqez - Beq.

(Waneya Pênc'an)

(3) - Pevguherîna Dengdaran

Di zimanê kurdî de, her tîpek taybetmendiyeke xwe heye, ji aliyê pevguherîna (bi hev guhartina) tîpan ve jî, gelek tîp bi hev.tên guhartin, lewre em dê bi hûrekî li ser hinek dengdaran rawestin.

Tîpa 'B':

Ev tîp 'B' di hinek zaravan de, taybetî di zarava zazakî de bi tîpa 'V' tê guhertin:

Bê deng	=	vê deng,
Kebanî	=	Kevanî.

Di kurtebiriya bêjeyan de 'B' bi 'p' tê guhartin, wisa jî di hin zaraveyên rojhilat de 'B' ya despêka bêjeyê bi 'P' tê guhartin.

Nimûne:

Bihnijîn	=	ponijîn.
Bi hev	=	pev.
Biçûk	=	piçûk.
Birûsk	=	pirûsk.

(Bi vî, bi vê, bi wî, bi wê) = pê.

Tîpa 'F':

Gava ev tîpa di navîna bêjeya lêkerî ya fermanî û bêjeyên hevedudanî (hevbend - hevgirtî - lêkdayî) de were, wê gavê ciyê xwe dide tîpa 'v'.

Nimûne:

Axaftin	=	baxêve.
Keftin	=	bikeve (fermanî).
Hefsar	=	hevsar.
Heftdeh	=	hevdeh (hevedudanî).

Tîpa 'T':

Ev tîpa hin caran ji navîn û dawiya bêjeyên sade (xwerû) û bêjeyên hevedudanî dikeve.

Nimûne:

Got	=	go.
Dît	=	dî (bêjeyên sade).
Destpêk	=	despêk.
Destmal	=	desmal (bêjeyên hevedudanî)

Tîpa 'V':

Ev tîpa di zaraveya Soranî de gelek hindik bi kar tê, ji ber ku ev tîpa di wê zaravê de ciyê xwe dide tîpa 'W'. Di zarava kurmancî û zazakî de jî, gelekî bi kar tê, lê pirî caran ev tîpa bi tîpa 'M' yê tê guhartin.

Nimûne:

Nav = nam,
Zave = zame,
Nîv = nîm,
Gav = gam,
Zîv = zîm, ...

Tîpa 'D':

Ger di bêjeyekê de li pey tîpa 'D', tîp bên kurtebirkirin, wê gavê 'D' bi 'T" tê guhertin.

Nimûne:

Diînim = tînim.
Di hev de = tev de.
(Di wê, di wî, di vê, di vî) de = tê de.

Tîpa 'N':

Hin caran ev tîpa ha ji dawiya bêjeyan dikeve.

Nimûne:

Min	=	mi,
Gundan	=	gunda,
Yên	=	yê.

Tîpa 'Ş':

Di bêjeyên hevedudanî de, ger bêjeya pêşîn bi 'ş' bi dawî (kuta) bibe, carna jî bi 'Ş' destpêbike, wê gavê 'ş' bi 'j' tê guhertin.

Nimûne:

Heştdeh	=	heşdeh = hejdeh.
Dişwar	=	dijwar.

Tîpa 'S':

Hin caran ev tîpa bi tîpa 'Z' tê guhartin, lê baştire ku di nivîsandinê de 'S' bê nivîsandin.

Nimûne:

Derbas	=	derbaz
Bibîse	=	bibîze
Mestir	=	mezintir

in terms of payment for the [illegible] payment suspension date will be covered by KfW. This includes our invoices for the work done in the first quarter (March/April /May), dated 6th June 2011, as well as the invoice for reimbursables, dated 29th June 2011, as these services were rendered before the cut off date of 27th June 2011. We kindly ask you to forward the respective disbursement requests to KfW in order to get paid within the period according to our contract. Only receipt of payment for these invoices will place CES in the financial position to continue with the limited services.

Registered Office:
38114 Braunschweig
District Court of Braunschweig:
Register of Companies HRB 101260

Deutsche Bank AG Braunschweig
Bank Code 270 700 30, Acc. № 0 782 300
Dresdner Bank AG Braunschweig
Bank Code 270 800 60, Acc. № 1 033 700

Managing Directors:
Dr.-Ing. Detlef Hüglin
Dr.-Ing. Ralf Meyerhoff

Tîpa 'K':

- Hin caran gava ev tîpa di despêka bêjeyan de were, bi tîpa 'G' tê guhertin.

Nimûne:

Kovar	=	Govar
Koçber	=	Goçber

- Hin caran jî, ev tîpa ji dawiya bêjeyan dikeve.

Nimûne:

Serşok	=	serşo
Berçavk	=	berçav
Bernavk	=	bernav

Tîpa 'W':

Li bajarên Rojava (Efrîn, Ruha, Meletiyê ...) di axaftinê de, tîpa 'W' ji binî ve ji ber tîpa 'X' rakirine.

Nimûne:

Xwîn	=	xûn
Xwe	=	xa
Xwarin	=	xarin

Tîpa (H):

Bikaranîna vê tîpê hino - hino di zimanê kurdî de kêm dibe û pirî caran ji despêk, navîn û ji dawiya bêjeyê tê avêtin.

- Êxistina 'H' ji despêka bêjeyê:

Hêş	dibe	êş
Hêvar	dibe	êvar
Hêriş	dibe	êriş
Haza	dibe	aza
Havêtin	dibe	avêtin

- Êxistina tîpa 'H' ji navîna bêjeyê:

Rehwan	dibe	rewan
Mêhvan	dibe	mêvan
Dergehvan	dibe	dergevan
Kehnî	dibe	kanî (teşeya kurtebiriyê)
Bihin	dibe	bîn (teşeya kurtebiriyê)

- Êxistina 'H' ji dawiya bêjeyê:

Şeh	dibe	şe
Fireh	dibe	fire
Fileh	dibe	file
Yanzdeh	dibe	yanzde

(Waneya Şeşan)

(4) - Hûrnivîs û Girnivîsa Tîpên Alfabêya Kurdî

Bi gelemperî em bi tîpên hûrek dinivîsin, lê di hin ciyan de em tîpên girdek bi kar tînin û taybetî di seretîpên peyvan de û pir hindik hinek peyvan em bi tîpên girdek dinivîsin.

Ciyên em tîpên girdek bi kar tînin ev in:

1- **Destpêka hevoka serbixwe:**
Welatê kurdan bindest e.

2- Navên serenav:

-Navê mirovan: Ocelan, Zîlan, Ronahî.
-Navê cîwaran: Ziravkê, Meydanê.
-Navê bajaran: Efrîn, Qamişlo.
-Navê welatan: Kurdistan, Hindistan.
-Navê avan (çem, robar, kehnî, derya...): Aras, Ferat.
-Navê rojên hefteyê: Çarşem, Pêncşem
-Navê mehan: Avdar, Gulan
-Navê cejnan: Newroz, Çarşema Sor
-Navê stêran: Perwîn, Gelawêj
-Navê bûyerên giran û navnas: Çelberf, Seferberî

3- Paşnav:

Kemal Pîr - Ehmed Kaya...

4- Navnîşan (sernav):

- Navnîşana pirtûkan :Parastina Gelekî (Apo).
- Navên pirtûkên pîroz: Avêsta
- Kovar: Leylan - Dengê Kurdistan
- Rojname: Azadiya Welat
- Gotar: Zimanê nivîskî û zimanê devkî (Samî Tan)

- Şano: Kî Memo dikuje (Beşîr Mele)
- Helbest: Aşotiya bendîxanê (Temoz Şemalî)
- Çêrok: Reşo Darî (Cegerxwîn)
- Roman: Bîra Qederê (Mihemed Uzun)
- Destan: Mem û Zînê (Ehmedê Xanî)

5- Ji bo balkêşiyê:

Ji bo balkêşiyê, mirov dikare hevokekê an peyvekê bi tîpên girdek binivîse:

- Di sala 1982`an de, li zîndana Amedê, BERXWEDAN JIYAN E, bû nîşaneya girtiyên azadiyê.
- ...`ji bona mizgîniya DIWAZDEHÊ AVDARÊ, li siwarê lingwindayî kin.

6- Kurtasî:

Kurtasî bi girdekan tên nivîsandin:

PKK - SZK - USA...

7-Piştî xal, cotxal, xalepirsî û xaleseyrê:

- Wî li mamoste vegerand û got: Ev wane me nebiriye.
- Wax derdo, Tu çiqas giranî!?
- Kengî tu ji çiya vegerî?

CA_____

CB_____

(Waneya Heftan)

(5) – Pevdeng (duçeng)

Pevdeng bi hatina tîpa 'W' li pey tîpa 'X' saz dibe û dengên wan bi alîkariya tîpek ji pênc tîpên dengdêr 'a – e – ê – ı – î' ji devê mirov dertê. Di zimanê kurdî de tenê pevdengek heye, ew jî 'XW' ye.

Pevdeng li pêşiya yek ji pênc tîpên dengdêr (a – e – ê – î – i) tê, lê li gelek herêman tîpa 'W' bi yek ji wan tîpan re dibe yek û dengekî didin û bi awayê jêrîn tên xwendin.

1– Yekbûna 'W' bi 'E' re, 'A' tê bilêv kirin:
Xwendin wisa (xandin) tê bilêv kirin.

2– Yekbûna 'W' bi 'A' re, 'A' tê bilêv kirin:
Xwastin wisa (xastin) tê bilêv kirin.

3- Yekbûna 'W' bi 'Î' re, 'Û' tê bilêv kirin:

Xwînmij wisa (xûnmij) tê bilêv kirin.

4- Yekbûna 'W' bi 'Ê' re, 'Ê' tê bilêv kirin:

Xwêdan wisa (xêdan) tê bilêv kirin.

5- Yekbûna 'W' bi 'I' re, 'U' tê bilêv kirin:

Xwirandin wisa (xurandin) tê bilêv kirin.

Sê têbîn li ser pevdengan:

Têbîn (1): Di rastnivîsê de, divê em bi awayê yekê binivîsin, ango tîpa 'W' bi kar bînin.

Têbîn (2): Li ser tîpa 'i' heya niha nelihevkirin heye, hin zimanzan bi teşeya 'wi' dinivîsin û hinek din jî, bi teşeya 'u' dinivîsin. Lê di baweriya min de, ew di resen de, bi awayê 'wi' dihat bilêv kirin, ji ber kurtasî û lezbûna nivîsandinê, ew awayê 'u' wergirtiye, lê ya rastir ji bo fêrbûna rastnivîsê, divê em jî weke Celadet 'wi' bi karbînin.

Nimûne:

Dixum	=	Dixwim
Xurt	=	Xwirt
Xuya	=	Xwiya
Xurandin	=	xwirandin

Têbîn 3): Divê mamoste gelek mînakan ji şagirtan re
ser pevdengê bînin ziman, binivîsin û şirove bikin k
kengî t pa 'W' bi tîpa 'X' re tê û kengî nayê (netê).

(Waneya Heştan)

(6) - Tîpên Cêwî (dudeng)

Pênase: Pênc tîp ji nav tîpên dengdar, du dengan didin, ango du awazan didin. Carna dengekî hişk û stûr didin û carna jî dengekî nerm û zirav didin. Ji van tîpan re, tîpên cêwî tê gotin ango dudengî. Ew jî ev in:

Ç - K - P - T - R.

Ji bo bilêvkirina tîpên hişk û nerm li vê xanxanika (latik, xişte) jêrîn binêre:

Tîp	Dengê hişk	Dengê nerm
Ç	Çeleng, Çar	Çerm, Çem
K	Kar, Kemal	Kal, Kovar
P	Parçe, Partî	Par, Pîvan
T	Têkoşîn, Taybet	Teng, Ter, Tej
R	Gur, Şervan, Zêr	Vir, Wir, Bêr

Sê têbîn li ser tîpên cêwî:

Têbîn (1): Li ser hişk û nermiya van tîpan ti rêzik tune ne, tenê bi bihîstin û ezberkirinê ji hev cudadibin.

Têbîn (2): Ji bo tîpa 'R' mirov dikare bêje, gava di despêka bêjeyê de an tîpa 'Î' di pey re were, her tim sert e, gava di pey tîpa 'R' re tîpa 'I' were, her tim nerm e, lê belê hinek awarte jî hene.

Nimûne:

Nerm:	Hişk:
Kirin	Kirîn
Birin	Birîn
Xwarin	Çirîn

Têbîn (3): Hin zimanzanan, ji bo çareserkirin cudanivîsandina tîpên cêwî, tîpa 'H' li wan zêde kirir ango wisa dinivîsin "çh - kh - ph - th - rh", lê mixab nikarîn ev pirsgirêk çareser bikirana, berovajî aloziyeke nû li rastnivîsandina kurmancî zêde ki Lewre em tevlî vê nerînê nabin.

(Waneya Nehan)

(7) - Tîpên Dubarekirî

Pênase: Di zimanê kurdî de tîp, di bêjeyekê de dubare nabe, lê dema di bêjeyekê de tîpek, bi awakî dubare bibe jî, yek ji wan, ji ber xwe de dikeve.

Nimûne:

Rast + tir	=	Rastir
Yek + kite	=	Yekîte
Paş + şîv	=	Paşîv
Gel + lek	=	Gelek
Ziman + nas	=	Zimanas

Pirî caran tîpên ne weke hev jî, ên ji yek cîderkê, an nêzî hev, ji devê mirov dertên, li pey hev nayên (netên), ger li pey hev hatin jî, yek ji wan dikeve.

Nimûne:

Bilind + tir	=	Bilintir
Dest + dirêj	=	Desdirêj
Dest + mal	=	Desmal
Rind + tir	=	Rintir

Têbîn: Lê hin caran ger du tîpên ji cîderkê dertên jî, di bêjeyekê de li pey hev hatin, weke xwe dimînin.

Nimûne:

Pir + tir	=	Pirtir

Sembol

Di van herdu bêjeyên jorîn de, du tîpên ji cîderkê 'R' û 'T', 'M' û 'B' li pey hev hatine, lê ti tîp ji wan neketine.

Ger, tîpa dubare ji hev cuda bin jî, yek ji wan di dawiya bêjeyê de be û ya din jî, di despêka bêjeyeke din de be, wê gavê herdu tîp tên nivîsandin, lê di xwendinê de tîpa pêşîn nayê bilêvkirin.

Nimûne:

1- Di nav gelê kurd de, gelek sîxur hene:
Wisa tê xwendin: "..kur de..."
2- Di axaftinê de, wî rast digot:
Wisa tê xwendin: "..ras digot".
3- Ez ji bajêr vegeriyam:
Wisa tê xwendin: "E ji bajêr...".

(Waneya Nehan)

(7) – Tîpên Dubarekirî

Pênase: Di zimanê kurdî de tîp, di bêjeyekê de dubare nabe, lê dema di bêjeyekê de tîpek, bi awakî dubare bibe jî, yek ji wan, ji ber xwe de dikeve.

Nimûne:

Rast + tir	=	Rastir
Yek + kite	=	Yekîte
Paş + şîv	=	Paşîv
Gel + lek	=	Gelek
Ziman + nas	=	Zimanas

Pirî caran tîpên ne weke hev jî, ên ji yek cîderkê, an nêzî hev, ji devê mirov dertên, li pey hev nayên (netên), ger li pey hev hatin jî, yek ji wan dikeve.

Nimûne:

Bilind + tir	=	Bilintir
Dest + dirêj	=	Desdirêj
Dest + mal	=	Desmal
Rind + tir	=	Rintir

Têbîn: Lê hin caran ger du tîpên ji cîderkê dertên jî, di bêjeyekê de li pey hev hatin, weke xwe dimînin.

Nimûne:

Pir + tir	=	Pirtir

Sembol

Di van herdu bêjeyên jorîn de, du tîpên ji cîderkê 'R' û 'T', 'M' û 'B' li pey hev hatine, lê ti tîp ji wan neketine.

Ger, tîpa dubare ji hev cuda bin jî, yek ji wan di dawiya bêjeyê de be û ya din jî, di despêka bêjeyeke din de be, wê gavê herdu tîp tên nivîsandin, lê di xwendinê de tîpa pêşîn nayê bilêvkirin.

Nimûne:

1- Di nav gelê kurd de, gelek sîxur hene:
Wisa tê xwendin: "..kur de..."
2- Di axaftinê de, wî rast digot:
Wisa tê xwendin: "..ras digot".
3- Ez ji bajêr vegeriyam:
Wisa tê xwendin: "E ji bajêr...".

Sê têbîn:

Têbîn (1): Weke li jor derbas bûye, her tim tîpa yekê dikeve.

Têbîn (2): Li gor rêzika jorîn ê ku dibêje: "Tê nivîsandin û nayê xwendin', em vajayî rêzika sereke diçin ê ku dibêje: "Di zimanê kurdî de, em çawa dinivîsin wisa jî em dixwînin û çawa em bilêv dikin, wisa em dinivîsin", ev rêzika jorîn rêzder e.

Têbîn (3): Hinek zimanzan û nivîskarên kurd du tîpên dengdar 'L - R' dubare dikin, weke di bêjeyên "gellek û pirr" de, lê belê gava em van tîpan weke tîpên dubare bipejrînin, divê em tîpa 'N' jî wisa bipejrînin.

Nimûne:

Genim	=	Gennim
Genî	=	Gennî

Wisa jî, aloziyên zimên em pir dikin. Ji bo vê mijarê, Celadet Bedirxan ji Osman Sebrî re gotiye: "Her kes hewl dide ku hejmara tîpên alfabêya xwe kêm bike, divê em berevajî xelkê nekin".

(Waneya Dehan)

(8) – Tîpên Girêkok (siwar, kelijandinê)

Pênase: Ew tîpên ku di bêjeyekê de dikevin navbera du tîpên dengdêr, jê re tîpên girêkok tê gotin.

Bi gelemperî di kurmancî de, du tîpên dengdêr di bêjeyekê de li pey hev nayên (netên), ger bi awakî du dengdêr di bêjeyekê de li pey hev hatin, wê gavê yek ji ber xwe ve dikeve, an tîpeke girêkok dikeve navbera wan, wan bi hev ve girêdide û xwendina wan bi hev re sivik û nerm dike.

Tîpên girêkok (siwar, kelijandinê) di zimanê kurmancî de tîpên dengdar in û hejmara wan jî, çar in: (Y – W – H – N) ew jî, weke nîvdengdêr tên binav kirin.

Têbîn: Sedema bikaranîna van tîpan ew e ku; di nav tîpên dengdar de bilêvkirina van tîpan (Y - W - H - N) ji hemû dengdarên din neyantir e.

1- Tîpa 'Y':

Bi gelemperî tîpa 'y' bi kar tê. Ev tîpa jî, piranî li pey van tîpên dengdêr tê: I - E - Ê - A

Gava tîpa 'î' an tîpa 'ê' berî tîpa 'y' yê werin, ji ber xwe de ew dibin 'i'. Li nimûneyên jêrîn binêre.

Nimûne:

Partî = Partiya Karkerên Kurdistanê

Rê = Riya azadiya gelan gelek dijwar e.

Çira = Çirayа mala me vemiriye.

Perde = Perdeya pencera biçûk sor e.

2- Tîpa 'W':

Bi gelemperî li pey tîpên dengdêr 'U - Û - O' tê, gava 'û' berî 'w' hat, bi 'i' tê guhertin.

Nimûne:

- Berû = Ciwanên gund li siya beriwa bilind kombûne.
- Parsû = Parsiwa min, par şikest.
- Xwesû = Min bîra xwesiwa xwe kirî.
- Pembû = Baran îsal bi ser pembiwa me de barî.

3- Tîpa 'H':

Tîpa girêkok 'H' di darijtina bêjeyên razber de bi kar tê.

Nimûne:

Pale + î	=	Palehî
Germa + î	=	Germahî
Rona + î	=	Ronahî
Aza + î	=	Azahî

Têbîn: Ev tîpa 'î' ya di bêjeyên jorîn de hatiye, ji koma parkîtên darijtina bêjeyên razber e. Koma parkîtên darijtina bêjeyên razber jî, evin:

tî: hevaltî
ayî: mezinayî
anî: dostanî
î: giranî

4- Tîpa 'N':

A- Bi gelemperî di banga gelejmara nêrza de, bi kar tê.

Nimûne:

1- gundî = gundînino

Li gor pêkhatinê wisaye: Gundî + n + in + o = gundînino.

Gundî (bêje bi xwe ye) + N (tîpa girêkok e) + IN (parkîta gelejmariyê ye) + O (alava banga nêrza ye).

2- partî = partînino

Ev gotin jî li gor pêkhatinê, weke nimûneya jorîn e:

Partî + n + in + O = partînino

Partî (bêje bi xwe ye) + N (tîpa girêkok e) + IN (parkîta gelejmariyê ye) + O (alava banga nêrza ye).

B- Ev tîpa girêkok 'N' gelek zimanzanan ji ber sedema kurtebiriyê, ji nav tîpên girêkok rahijtine, ango bi awayê kurtebirî van bêjeyan bikar tînin.

Nimûne:

Gundî = gundîno

Partî = partîno

Du têbîn li ser girêkokan:

Têbîn (1): Hinek zimanzan dengdêra 'i' di bêjeyên lêkerî (lêkera dûdar) de, ya bi tîpeke dengdar temam dibe, weke tîpeke girêkok binav dikin.

Nimûne:

reviye, beziye, biriye...

Têbîn (2): Hin caran tîpa 'S' jî, rola tîpa girêkok dilîze, lê gelekî hindik bi kar tê.

Nimûne:

kêmasî, kurtasî, tengasî, mirdasî, kirdasî.

Lê hinek jî 'asî' yê ku di dawiya bêjeyên jorîn de hatine, weke paşgir pejirandine.

(Waneya Yazdehan)

(9) – Girêkokên Peyvan

Pênase: Ew tîpên dengdêrin ku, du bêjeyan bi hev ve girêdidin, ango dikevin navbera du bêjeyan û herdiwan dike bêjeyeke hevedudanî. Di bêjeyên hevedudanî de, gava tîpa dawiyê ji bêjeya yekê û tîpa despêkê ji bêjeya dudiyê ji cîderkê bin an nêze hev bin, xwendina bêjeyê giran û sert dikin, lewre girêkokek peyvan dikeve navbera herdu peyvan ji bo xwendina bêjeyê sivik û nermtir bike.

(A) – Girêkokên peyvan evin:

E – Û – A

Nimûne:

E:Rasterast, sertesert, soresor

Û:Danûstandin, çûnûhatin, şevûroj, jorûjêr...

A:Seraser, beraber, rengareng...

Du têbîn li ser girêkokên peyvan

Têbîn (1): Bi gelemperî girêkoka 'Û' di navbera du bêjeyên hevdij de bi kar tê. Lê awarteyên wê jî hene.
Nimûne:

Reşûpeş, şilûpil, şêlûbêl, şoxûşeng, ...

Têbîn (2): Bi gelemperî girêkoka 'E' di navbera du bêjeyên dubare de tê, lê awarteyên wê jî hene.
Nimûne:

keskesor, reşeba, şîregerm, çelexar...

(Waneya Diwazdehan)

(10) - Lipeyhevhatina Dengdêran

Weke di despêka mijarê de, me li jor aniye ziman, gava du dengdêr di bêjeyekê de li pey hev tên, yek ji wan, ji ber xwe de dikeve, ew jî di rawe û demên jêrîn de çêdibin:

1- Raweya fermanî: Bi +alês = balês

2- Dema niha: Di + avêje = davêje

3- Raweya fermanî ya neyînî:
na + ajo = najo

4- Raweya fermanî ya erênî:
bi + ajo = bajo

5- Weke rengdêran: bi + aqil = baqil

- Gava du tîpên dengdêr, yek dengkin (dengkurt) û yek dengdirêj, di bêjeyekê de li pey hev werin, her tim tîpa dengkin ji bêjeyê dikeve. (Li nimûneyên jorîn vegere).

- Gava du tîpên dengdêr ên dengdirêj di bêjeyekê de li pey hev bên, ti tîp ji wan nayên helandin, ango ji bêjeyê nayên avêtin.

Nimûne:

- Bêoliya wî ew winda kir.
- Xweavêtina ji baniyê xanî de, lingê xwe şikand.

(Waneya Sêzdehan)

(11) – Êxistin û Kurtebiriya Tîpan

Zimanê kûrdî her tim daye pey şopa kurtebiriyê. Ev kurtebiriya hin caran bi êxistina tîpan pêk hatiye û hin caran jî, bi kurtebiriya çend tîpan bi tîpekê pêk hatiye.

Kurtebiriya bi êxistina (avêtina) tîpan:

Nimûne:

Destgeh	dibe	dezgeh
Destmal	dibe	desmal
Badzin	dibe	bazin
Destgirtî	dibe	dezgirtî
Gurçîlik	dibe	gurçik
Mezintir	dibe	mestir

- Gava du tîpên dengdêr, yek dengkin (dengkurt) û yek dengdirêj, di bêjeyekê de li pey hev werin, her tim tîpa dengkin ji bêjeyê dikeve. (Li nimûneyên jorîn vegere).

- Gava du tîpên dengdêr ên dengdirêj di bêjeyekê de li pey hev bên, ti tîp ji wan nayên helandin, ango ji bêjeyê nayên avêtin.

Nimûne:

- Bêoliya wî ew winda kir.
- Xweavêtina ji baniyê xanî de, lingê xwe şikand.

(Waneya Sêzdehan)

(11) – Êxistin û Kurtebiriya Tîpan

Zimanê kûrdî her tim daye pey şopa kurtebiriyê. Ev kurtebiriya hin caran bi êxistina tîpan pêk hatiye û hin caran jî, bi kurtebiriya çend tîpan bi tîpekê pêk hatiye.

Kurtebiriya bi êxistina (avêtina) tîpan:

Nimûne:

Destgeh	dibe	dezgeh
Destmal	dibe	desmal
Badzin	dibe	bazin
Destgirtî	dibe	dezgirtî
Gurçîlik	dibe	gurçik
Mezintir	dibe	mestir

Têbîn: Tîpa 'H' gelekî tê êxistin, ji despêk, navîn û dawiya bêjeyan. (Vegere xaleyên jorîn ên li ser tîpa 'H' hatine).

- Hin caran daçek û bernav bi hev re kurtebir dibin:

Bi + hev = pev
Bi + êk = pêk
Di + hev = tev
Ji + êk = jêk
Di +êk = têk
Ji + hev = jev
(Di + vî, Di + vê, Di+wî, Di+wê) de = tê de
(Ji + vî, Ji + vê, Ji + wî, Ji + wê) ve = Jê ve
(Bi + vî, Bi + vê, Bi + wî, Bi + wê) re = pê re

- Hin caran berlêker (bi - di) û lêker bi hev re kurtebir dibin.

Nimûne:

Di + êşe = dêşe
Di + avêj = davêje
Bi + axêve = baxêve
Bi + ales = bales

- Tîpa 'H' tev tîpên dengdêr, di bêjeyên sade de, bi tîpeke dengdêr tê guhertin. (eh) dibin (a):

Behr = bar (par)
Dehnû = danû
Kehnî = kanî

- Kêm caran koma tîpan 'ehe' dibe 'a':

Xweher	=	xwar

- "Eh û ey" dibin 'ê':

Reh	=	rê
Şeh	=	şê
Mehvan	=	mêvan
Pey	=	pê
Keyf	=	kêf

- Hin caran koma tîpan "ih, ihi û iyi" dibin 'î':

Sih	=	sî
Cih	=	cî
Bih	=	bî
Mih	=	mî
Tirih	=	tirî
Gilih	=	gilî
Dihin	=	dîn
Hiyiv	=	hîv

- 'Uh' hin caran dibe 'o' û hin caran jî dibe 'û':

Buhtan	=	botan
Nuh	=	nû
Biruh	=	birû

- Hin caran koma tîpan 'ih, wî, we û ihu' dibin 'o':

Rihnî	=	ronî
Ajihtin	=	ajotin
Kwîr	=	kor
Werdek	=	ordek
Dihun	=	don
Bihust	=	bost

- Hin caran tîpên 'w' û 'î' bi hev re dibin 'û':

Diwîr	=	Dûr
Kwîr	=	kûr
Xwîn	=	xûn
Xwîşk	=	xûşk

Têbîn: Ji şirovekirina jorîn xuya dike ku, koma tîpan 'eh', carina dibe 'a' û carina dibe 'ê'.

- Wisa jî koma tîpan 'ih' carina dibe 'o' û carina dibe 'î'.
- Herwiha 'wî' hin caran dibe 'û' û hin caran dibe 'o'.

(Waneya Çardehan)

Kît (kîte, kit, kite)

Pênase: Bi vekirina devê mirov re dengek derdikeve, ji vî dengî re, kît tê gotin. Ango ji perçe û movikên bêjeyekê re kît tê gotin.

- Ji bo kîtê pêdivî bi dengdêrekê heye, ango kît bêyî tîpeke dengdêr nîne. Tîpeke dengdêr dikare bi serê xwe kîtek be, lê ti carî dengdarek nikare bi tena xwe kîtekê pêk bîne.

- Her bêjeyek ji yek kîtê, an jî ji çend kîtan ava dibe, çiqas dengdêr di bêjeyekê de hebin, ew qas kît jî hene.

Nimûne:

(Av): Bêjeyeke yekîte ye, ji ber ku tenê tîpek dengdêr di bêjeya 'av' de heye.

(Bahoz): Bêjeyeke du kîteyî ye, ji ber ku du tîp dengdêr di bêjeya Bahoz (ba + hoz) de hene.

- Kîteyên zimanê kurdî ji tîpekê ta pênc tîpan peyda dibin:

1- Kîteyên yek tîpî:

a - e - ê - û

2- Kîteyên du tîpî:

ba - du - me - al

3- Kîteyên sê tîpî:

reş - van - mal-dar

4- Kîteyên çar tîpî:

deng - teng - xurt - kurd

5- Kîteyên pênc tîpî:

stran - stand

Kîteyên bêjeyî:

Di zimanê kurdî de, her bêjeyek ku ji kîtekê pêk tê, jê re dibêjin yekîte, an ji kîtekê pirtir jê re dibêjin pirkîte.

a- Bêjeyên yekîte:

mal - dar - kar - bar

b- Bêjeyên pirkîte:

Serok-berxwedan - çûnûhatin -liberxweketin - rojnamegerî

Cureyên kîteyan:

Di kurdî de, du cure kîteyan hene:

1- Kîteyên servekirî (vekirî):

Kîteyên ku bi tîpeke dengdêr bi dawî dibin.

Nimûne:

Sa - ba - re - de

2 - Kîteyên sergirtî (girtî):

Al - mal - dar - sar - ber

(Waneya Panzdehan)

Peyv (bêje, pirs, gotin)

Pênase: Peyv, ew dengê ku ji devê mirov der tê, ji kîteyekê an ji pir kîteyan pêk tê û xwedî wate û peywirekê ye. Ger çiqas deng hebin û ne xwedî wateyekê bin, ji wan dengan re peyv netê gotin.

Di vê mijarê de, li gor hejmara kîteyan, wate û çêbûna wan, em dê li ser peyvê rawestin.

1- Peyv, li gorî hejmara kîteyan:

Li gorî hejmara kîteyên ku peyv jê saz dibe, dabeşî ser du beşan dibe:

a- Peyvên yekîte:

Al, şer, germ, berf

b- Peyvên pirkîte:

Baran, qeşa, Hemrîn, tolhildan, serkeftin

2- Peyv, li gorî wateya xwe:

Peyv li gorî wateya xwe li ser sê beşan dabeş dibe, ew jî ev in:

A- Peyvên hevwate (hemwate):

Wateya van peyvan weke hev in, lê belê xwendin û bilêvkirina wan, ji hevdu cuda ne.

Nimûne:

Rex - cem - ba - ber - nik - tenişt - kêlek...
weke - mîna - mînak - werga - nola - bîna...
bêje - peyv - gotin - axêv - şor...

B- Peyvên hevdeng:

Di zimanê kurdî de, peyvin hene weke hev tên nivîsandin, lê di bilêvkirin û wateya xwe de ji hev cuda ne. Ew jî li gor derbdayîna bilêvkirinê an li gor hişkûnermiya (li gor cêwîtiya tîpan: Ç - K - P - R - T) hinek tîpan wateya peyvê xuya dike.

Nimûne:

Li latika (xanxanika) jêrîn binêre:

Peyv	Bilêvkirina hişk ji tîpa cêwî re yan derbdayîn	Bilêvkirina nerm ji tîpa cêwî re
Ker	Bi wateya lawir	Bi wateya nabihîse
Vir	Bi wateya derew	Bi wateya vê derê
Gelek	Bi wateya hejmara pir	Bi wateya gel (milet)
Ta	Bi wateya nexweşî	Bi wateya dezî
Şîn	Bi wateya reng	Bi wateya xemgînî
Pîr	Bi wateya kesê kal	Bi wateya pîroz û mezinên êzîdiyan
Par	Bi wateya parêkirin	Bi wateya sala derbasbûyî
Tûj	Bi wateya kêra tûj	Bi wateya xwarina tûj

- Gelek peyvên hevdeng di zimanê kurdî de hene, lê ne hemû peyv bi hişkûnermiya xwendina tîpa cêwî wateya wan diyar dibe, lê belê gelek caran bi xwendina derbdayînê, wateya wan ji hev cuda dibe. Hin caran jî, li gorî hevoka ku ew peyva tê de, wateya wê xuya dibe.

Nimûne:

Tûj, ker:

Ev kêra mezin ne gelekî **tûj** e.

Ev îsota (bîbera) sor qet ne **tûj** e.

Bêjeyên te ji wî re kirine, gelekî **tûj** bûn.

(*) Bêjeya 'tûj' di her sê hevokên jorîn de hatine, her yek bi mebesta wateyekê hatiye, wisa jî bêjeya 'ker' yê ku di her du hevokên jêrîn de hatine:

- Bi teqîna bombeyê re, guhê hevalê min ker bû.
- Hespê te ji kera min bezotir e.

C- Peyvên dijwate:

Ew peyvên ku di wateya xwe de, dijberiya hevdu dikin.

Nimûne:

jêr / jor
şer / aşîtî
çep / rast
reş / spî

(Waneya Şanzdehan)

3- Peyv li gorî çêbûna (sazbûna) xwe:

Peyv li gorî çêbûnê dabeşî ser du beşan dibe: Peyvên xwerû (salt, sade) û peyvên nexwerû (nesade).

a- Peyvên xwerû (sade-salt):

Ev peyv tenê ji hêmanekê pêk tên û ji hev nayên xistin, ger ji hev bê xistin jî, wateya xwe ya resen winda dikin, lewre ev cureya ji peyvan, bi xwe jêder in (ra, kok) in.

Nimûne:

Azad - dest - deşt - berx - kon - roj - dar - çiya - mal

b- Peyvên nexwerû (nesade-nesalt):

Ev cure peyva ji hêmanekî pirtir pêk tê û bi xwe dabeşî ser sê cureyan dibin: pêkhatî, hevedudanî û bargiranî.

I- Peyvên pêkhatî:

Ev cure peyv bi alîkariya pêşgir (pêrkît, pêşpirtik, pêşgîn) û paşgiran (parkît, paşpirtik, paşgîn) saz dibe.

(1)- Pêşgirên peyvên pêkhatî: gelek in lê yên pir bi kar tên ev in:

Ba - da - her - hil - hem - hev - ra - rê - rû - ve - wer

Nimûne:

- Ba (ramana zivirandinê dide): Badan.
- Da (ramana daketin, têkirin û dadanê dide): Dagirtin, dakirin.
- Her (ramana ketinê dide): Heraftin.
- Hil (ramana hilkişîn û bilindbûnê xuya dike): Hilgirtin, hilweşandin.
- Hem (ramana alîkarî û wekheviyê xuya dike): Hemkar.
- Hev (ramana hevkariyê xuya dike): Hevkar, hevpar, hevbeş.
- Ra (ramana bizava bervejor xuya dike): Rakirin.
- Rê (ramana şandin û rêkirinê xuya dike): Rêketin, rêxistin.
- Rû (ramana danîna serhev, an bizava bervejêr xuya dike): Rûniştin.

- Ve (ramana vekirin û nûkirinê xuya dike): Vekirin, vejîn.
- Wer (ramana zivirandinê xuya dike): Wergirtin, wergerandin.

* Hin caran ev du kîteyan (kele + zir) jî, weke pêrkîtan bi kar tên:

Kele: kelekok, kelereş, keleşêr, kelevajî.
Zir: zirbav, zirbira, zirsosin, zirpûng, zirnêrgiz.

(2)- paşgirên peyvên pêkhatî:

Ev parkît di zimanê kurdî de gelek in, lewre tenê em dê navê komên wan parkîtan binivîsin.

Paşgirên peyvên pêkhatî gelek in, lê yên pir bi kar tên ev in:

1- Paşgirên navên biçûker saz dikin:
(ik - o - ok - înok - işk - ole - olek - onek - çe-or).

Nimûne:

Ik:	Darik, malik
O:	Xirp + o = xirpo
Înok:	Xap + înok = xapînok
Ok:	Ken + ok = kenok
Olek:	Gul + olek = gulolek
Işk:	Germ + işk = germişk

Ole: hişk + ole = hişkole
Onek: Tirs + onek = tirsonek
Çe: Derya + çe = deryaçe
Or: Gul + or = gulor

2- Paşgirên navê lûsê (cih) saz dikin:
(geh - istan - xane - zar - lîn - lan)

Nimûne:

Geh: Xwarin + geh = xwaringeh
Istan: Kurd + istan = Kurdistan
Xane: Pirtûk + xane = pirtûkxane
Zar: Tenge + zar = tengezar
Lîn: Hê + lîn = hêlîn
Lan: mar + lan = marelan

3- Paşgirên navê alavê saz dikin:
(Ek - ing - dan - çîv - ok)

Nimûne:

Ek: Sar + ek = sarek
Ing: Bêj + ing = bêjing
Dan: Gul + dan = guldan
Çîv: Kil + çîv = kilçîv
Ok: Bihîst + ok = bihîstok

4- Paşgirên rengdêran saz dikin:

(a - al - ak - ane - asa - awer - bar - dar - e - ende - gaz - gir - gon - ver - ûr - gar - ek).

Nimûne:

A:	Zan + a = zana
E:	Gewr + e = gewre
Al:	Hev + al = heval
Ende:	Bal + ende = balende
Gaz:	Gerden + gaz = gerdengaz
Ak:	Ron + ak = ronak
Gir:	Alî + gir = alîgir
Ane:	Şêr + ane = şêrane
Gon:	Ar + gon = argon
Asa:	Dêw + asa = dêwasa
Awer:	Ceng + awer = cengawer
Bar:	Xem + bar = xembar
Ûr:	Renc + ûr = rencûr
Dar:	Naz + dar = nazdar
Gar:	Roj + gar = rojgar
Ek:	Kul + ek = kulek
Ver:	Giro + ver = girover
Er:	Koç + er = koçer
Êr:	Dil + êr = dilêr

5- Paşgirên nijad, peywendî û endametiyê nûnerî: (î - în).

Nimûne:

Î: Efrîn+î=Efrînî, helandî-bilindî-kurdî-nêrî

În: Zêr + în = zêrîn, şîrîn, goştîn

6-Paşgirên xeyset, xweserî û kirina kesekî an tiştekî xuya dikin:

(Kar - mend - van - war - wer - yar - dar - dêr - bend - baz - saz)

Nimûne:

Kar:	Cot + kar = cotkar
Mend:	Bawer + mend = bawermend
Van:	Helbest + van = helbestvan
War:	Bende + war = bendewar
Wer:	Giyan + wer = giyanwer
Yar:	Bext + yar = bextyar
Dar:	Dil + dar = dildar
Dêr:	Reng + dêr = rengdêr
Bend:	Saz + bend = sazbend
Baz:	Can + baz = canbaz
Saz:	Derman + saz = dermansaz

7- paşgirên hokeran saz dikin:
(ane - e - kî).

Nimûne:

Ane: Dilîr + ane = dilîrane

E: Sor + e = sore
Nêzik + e = nêzike

Kî: Dev+kî= devkî, nivîskî, mîvankî

8- Paşgirên bêjeyên razber saz dikin:
(ayî - tî - î - anî)

Nimûne:

Ayî: Germ + ayî = germayî

Î: Giran + î = giranî

Tî: Bira + tî = biratî

Anî: Pir + anî = piranî

9- paşgirên nependiyê saz dikin:
(ek - in)

Nimûne:

Ek: Keç + ek = keçek, malek, xortek, mirovek.

In: Keç + in = keçin, malin, xortin, mirovin.

10- Hinek rayên lêkeran jî, wek paşgiran bi kar tên û peyvên pêkhatî saz dikin. Ew jî ev in:

Avêj (avêtin):	Tiravêj - rimavêj
Ber (birin):	Dilber
Bêj (gotin):	stranbêj
Bir (birîn):	Darbir
Çîn (çandin):	Gulçîn
Dirû (dirûtin):	Çermdirû
Ger (gerîn):	Şoreşger
Guhêz (guhastin):	Denguhêz
Gir (girtin):	Rastgir
Jen (jentin):	Avjen
Jimar (hijmartin):	Demjimar
Kêş (kişandin):	Balkêş
Kuj (kuştin):	Evînkuj
Kut (kutan):	Hirîkut
Mal (malistan):	Desmal
Niwaz (niwaztin):	Hestniwaz
Pêj (pajtin):	Goştpêj
Pîv (pîvan):	Germepîv
Rêj (rijandin):	Xwînrêj
Teraş (teraştin):	Darteraş
Şo (şuştin):	Serşo
Xwaz (xwastin):	Azadîxwaz
Ker, ger (kirin):	Zêrker, Hesinger
Nivîs (nivîsandin):	Çêroknivîs
Parêz (parastin):	Welatparêz

(Waneya Hevdehan)

II- Peyvên hevedudanî (hevbend, hevgirtî):

Ev peyv ji pevgirêdana du peyvên xwerû, an ji dubarekirina peyvekê pêk tê:

(1)- Pevgirêdana du peyvan:

Di zimanê kurdî de, peyvên ku bi hev re dibin yek û peyveke nû sazdikin ev in:

Navdêr (nav) - rengdêr (hevalnav, rewş) - daçek (pêrpest) - lêker (pîşk) - bernav (cînav, pronav) - jimarnav - hoker (nîr).

Nimûne:

1- Navdêr + navdêr = peyveke hevedudanî :

Arav - Mihemedemîn

2- Navdêr + rengdêr = peyveke hevedudanî:

Çavreş - bextreş

- Dibe ku navdêr û rengdêrê ciyê xwe bi hevdu biguhêrin:

Sorgul - pîrjin

3- Rengdêr + lêker = peyveke hevedudanî:

Bedkar - sorkirin

4- Navdêr + lêker = peveke hevedudanî:

Darbirîn - şîrvexwarin

5- Lêker + lêker = peyveke hevedudanî:

Çûnhatin - danstandin

6- Hoker, daçek, bernav an jimarnav dikevin pêşiya peyvan (dibe ku ew peyv navdêr, rengdêr an lêker be) û peyveke hevedudanî saz dikin:

- Hoker + navdêr = peyveke hevedudanî:

Bindest - sermal

- Daçek + navdêr = peyveke hevedudanî:

Bixem - jidil

- Bernav + lêker = peyveke hevedudanî:

Xwedîtin - Pêgirtin

- Jimarnav + navdêr = peyveke hevedudanî:

Çarlep - sêdeng

(2)- Dubarekirina (ducarekirina) peyvekê:

Bi dubarekirina peyvekê jî peyva hevedudanî saz dibe (tê çêkirin):

1- Navdêr + navdêr = peyveke hevedudanî:
Rengareng

2- Rengdêr + rengdêr = Peyveke hevedudanî:
Soresor - rasterast

3- Jimarnav + jimarnav = peyveke hevedudanî:
Çareçar - yekoyeko

4- Raya lêkerê + raya lêkerê = peyveke hevedudanî:
Reverev - bezebez

Têbîn: Çend tîp dengdêr hene (a - e - û) dikevin navbera du peyvan û peyveke hevedudanî sazdikin, ji wan re navgir (girêkokên peyvan, navbir) tê gotin, lê di mijara tîpên girêkok de me weke girêkokên peyvan bi kar anîne.

Nimûne:

A: seraser - beraber - rengareng
E: rasterast - keskesor - saresar
Û: şevûroj - jorûjêr - çepûrast

III- Peyvên bargiranî:

Ev peyv ji pevxistina du hêmanan pirtir pêk tê, ji pevxistina peyveke hevedudanî û hêmaneke din, an jî ji gelek peyvan saz dibe.

Nimûne:

1- Peyveke hevedudanî + parkîtekê = peyveke bargiranî:

Serbestî - yekahengî

2- Ji gelek peyvan: hoker + navdêr + lêker = peyveke bargiranî:

Binavkirin-bermalketin-liberxweketin-biserdeketin

Beşên peyvan:

Gava mirov dipeyive, gelek peyvên serbixwe ji dev dertên, ev hemû peyv li ser neh beşan parve dibin. Ew jî li ser du biran parve dibin, peyvên guhêrbar (guhêzok) û peyvên neguhêrbar (neguhêzok):

1- Pevên guhêrbar:

çar in, ew jî ev in:

a- Navdêr:

Ferhad - Kurdistan - Xeçê - Xezal

b- Bernav:

Ez - wî - wê - vê - vî

c- Jimarnav:

Yek - deh - çardeh

ç- Lêker:

Çû - xwar - bezî - dibeze

2- Peyvên neguhêrbar:

pênc in, ew jî ev in:

a- Rengdêr:

Spî - bilind - biçûk

b- Daçek:

Bi - ji - li - bê

c- Gihanek:

Ango - lewre - ku - û

ç- Baneşan:

Lo - lê - wax

d- Hoker:

Tenişt - bin - îsal - hingê

(Waneya Heşdehan)

Hevok

Pênase: Hevok, ew şêwe û awayê rêstina peyvan li pey hev, li gorî rêz û rêçikên ziman e. Gelek cureyên hevokan di zimanê kurdî de hene, em dê di rêbaza qonaxa dudiyan de berfereh li ser rawestin.

Birên hevokê:

Di her zimanekî de, hevok li gor wate û karê ku hilgirtî ser xwe, li ser deh biran parvedibe, birên hevokê (cureyên peyvan) jê re tê gotin, ew jî ev in:

1- Navdêr
2- Rengdêr
3- Bernav
4- Veqetandek (zêder)

5- Hoker
6- Daçek
7- Jimarnav
8- Gihanek
9- Lêker
10- Baneşan

Cureyên hevokê:

Hevok li gorî bihevketin, binesazî, wate, delamet (erk, peywir) û pêkhatina xwe ji hev cudadibin. Li gorî vê, cureyên hevokê ev in: Hevoka navane û hevoka lêkerî.

A- Hevoka navane:

Tenê ji navan û bêjeyên ku ciyê navan digrin pêk tê.

Nimûne:

Kurdistana bindest.
Cîwarê gerîlayan.

B- Hevoka lêkerî:

Hevoka ku lêker tê de hebe, ango kirin an bûyînekê nîşan bide.

Nimûne:

Gerîla şer dikin.

- Ev cure hevok jî di nav xwe de, li ser neh beşan dabeş dibe.

1- Hevoka neyînî:

Neyîniya tiştekî xuya dike.

Nimûne:

Kurdistan rizgar nebûye.

2- Hevoka pirsiyariyê:

Di hevokê de, pirsekê nîşan dide.

Nimûne:

Tu dizanî hevala Şîlan çawa şehîd bû?

3- Hevoka baneşanê:

Kêf, xwezî û matmayînê nîşan dide.

Nimûne:

Lo hevalino, xwezî win li ba me bana!

4- Hevoka fermaniyê:

Di vê hevokê de, divê fermaniyek hebe.

Nimûne:

Ala rengîn bilind bike.

Heya sibehê bi min re ne axive.

5- Hevoka hekînî:

Pêkhatina kar, an bûyînekê bi pêkhatina karekî, an bûyîneke din ve girêdayî ye.

Nimûne:

- Ger (heke) gerîla ji bo azadiyê şer nekin, em serfiraz nabin.
- Ta ku Kurdistan rizgar nebê, çiya wê her tim cîwarê gerîlayan be.

6- Hevoka hokerî:

Demekê xuya dike.

Nimûne:

- Gava ez hatim, Xecê li mala me bû.
- Leşkerên dijmin dengê gerîlayan kirin, reviyan.

7- Hevoka pêreyê:

Pêreyê navdêrekê yan pêreyê lêkerekê ye.

Nimûne:

- Min pir dixwast te bibînim, lê riya min li ba te neket.
- Dijmin xweş dizane ku ji ser vê dozê em venagerin.

8- Hevoka pêvegiha:

Di hevokên hevedudanî de, hevoka pêvegiha rola rengdêrê distîne û pê radibe.

Nimûne:

- Keçika ku min li seyranê dîtiye, hate vir.
- Gundên ku dewleta Tirkan vala kirine, gelek in.

9- Hevoka hevedudanî:

Ji gelek hevokên hêsan pêk tê.

Nimûne:

Hevala delal, ji bo azadiyê, xwe cangorî kir.

FERHENGOK

Rêziman	قواعد اللغة	Pêrkît	سابقة
Ziman	اللغة	Parkît	لاحقة
Ferheng	قاموس	Darajtin	اشتقاق
Tîp	حرف	Mêza	مؤنث
Kît	مقطع الكلمة	Nêrza	مذكر
Bêje, peyv	كلمة	Kurtebirî	اختصار
Hevok	جملة	Êxistin	حذف
Hêman	عنصر	Ango	بمعنى
Dengdêr	حرف صوتي	Durv	شكل
Dengdar	حرف ساكن	Cure	نوع
Pênase	تعريف	Navîn	أوسط
Hûrek	حرف صغير	Qirikî	الحلقي
Girdek	حرف كبير	Fermanî	الأمر
Asta	مستوى	Neyînî	النفي
Dirêj	طويل	Pirsyarkî	السؤال
Nimûne, mînak	مثال	Sergirtî	نهايته حرف ساكن
Kurt, kin	قصير	Servekirî	نهايته حرف صوتي
Awa	شكل	Hejmar	عدد

Taybetmendî	خصوصية	Wate	معنى
Gelejimar	جمع	Xwerû,sade	مجرد
Yekejimar	مفرد	Pêkhatî	كلمة ذات لاحقة أو سابقة
Gelemperî	بشكل عام	Hevedudanî	كلمة مركبة
Biyanî	أجنبي	Bargiranî	كلمة من عدة كلمات
Cîderketin, cîderk	مكان خروج الحرف من الفم	Hevdeng	كلمتان متشابهان بالحروف ومختلفان بالمعنى
Girêkok	رابط	Hevwate	كلمتان متشابهان بالمعنى ومختلفان بالحروف
Xwezî	التمني	Beş	قسم
Despêk,destpêk	بداية	Dabeş	تقسيم
Dawî	نهاية	Guhêrbar	متغير
Cêwî	حرف ذات صوتين	Neguhêrbar	غير متغير (جامد)
Pevdeng	حرفان يعطيان صوتا واحدا	Navdêr	الاسم
Guhertin	تغير	Rengdêr	صفة
Dubare	تكرار	Daçek	حرف الجر
Têbîn	ملاحظة	Jimarnav	اسم العدد
Pevguherîn	تبديل	Bernav	ضمير

		(cînav)	
Hoker	ظرف	Zarava	لهجة
Baneşan	نداء	Peywir	مهمة
Gihanek	حرف عطف	Şêwe	أسلوب
Rêbaz	منهاج	Raya lêkerê	جذر الفعل
Lêker	فعل	Pendî	معرف
Hevoka lêkerî	الجملة الفعلية	Nependî	نكرة
Nav	اسم	Alozî	مشكلة
Hevoka navane	الجملة الاسمية	Xaleşanî	علامات الترقيم
Jêder	مصدر	Bêhnok	فاصلة
Hekînî	شَرطيّ	Xalebêhnok	فاصلة منقوطة
Pêvegiha	موصل	Xalepirs	علامة استفهام
Alîkar	مساعد	Xaleseyr	علامة تعجب
Deng	صوت	Xal	نقطة
Bingeh	أساس	Xalecot	نقطتان
Rêzbûn	ترتيب	Kom	مجموعة
Alfabê	الأبجدية	Nemaze	خاصة
Axaftin	التحدث (التكلم)	Navber	ما بين
Girîng	مهم	Çewt	خطأ
Hûrnivîs	الكتابة بالاحرف الصغيرة	Girnivîs	الكتابة بالاحرف الكبيرة
Zêdek (+)	زائد	Kêmek (-)	ناقص
yekîte	ذات مقطع واحد	pirkîte	ذات عدة مقاطع

Çavkaniyên Sereke:

1- Amadekar (Kamîran Bêkes, Memê Alan û Rozad Elî) - Rêzimana Kurdî-Weşanên Newrozê-2001.

2- Amadekar Mihemed E. Elî - Ji Bingehên Rêzimana Kurdî (pirtûka fêrbûnê) - Ji Weşanên Newrozê - çapa Duyem 2003.

3- Arif Zêrvan: Bigehên raste nivîsandina kurdiyê (kurmancî) Weşanxana Nefel - Siwêd.

4- Berzo Mehmûd - Rênivîsa peyva kurdî (liken û nelikan) - çapa yekê Beyrût - 2005.

5- Celadet Elî Bedirxan - Bingehên Gramera Kurdmancî - Stockholm - 2002.

6- Celadet Alî Bedirxan - Bingehên Gramera Kurdmancî - Weşanên Nûdem - 1994.

7- Celadet Bedirxan û Roger Lîsko - Rêzimana zimanê kurdî (zarava kurmancî) - wergerandin ji Erebî re Dîlawer Zengî - Çapxana dar elelim.

8- Dibistana Mexmûrê - Bernameya Rêziman ya Dibistana Ziman û Perwerdeya Kurdî.

9- Deham Ebdulfettah - Zimanê Kurdî (rênivîs) - Beyrût -1998.

10- Deham Evdilfetah - Hindek Aloziyên Zimanê Kurdî (kurmancî) - çapxana El Kîteb El Erebî - Şam - 1993.

Ji weşanên SZK-Rojava

11- Fadil Umer: Çend awirek li zimanê kurdî - dezgeha sepîrêz ya çap û weşanê Dihok.

12- Kovara Lêkolîn - Hejmara Yekê - Weşanên Înstîtuya Kurdî - 1995.

13- Kemal Burkay - dersên zimanê kurdî - weşanên Roja Nû - Gulan 2000.

14- Kemal Burkay - Dersên Zimanê Kurdî - Weşanên Roja Nû - 1988.

15- Nîzamettîn Akkurt - Rêznameya Rastnivîsê - Weşanên SZK - çapxaneya Azadî - 2004.

16- (Nûsret Kurt, Nîzamettîn Akkurt, Ehmadê Meryemê, Kenan Kaya) - Rêzimanê Kurdî - Wêşanên SZK - 2003.

17- Qanatê Kurdo - Zimanê Kurdî (rêziman) - Weşanên Komkar - 1981.

18- Reşîd Kurd: Rêziman a Zimanê Kurmancî, Beyrût - 1990.

19- Samî Tan - Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî - Weşanên Enstituya Stenbolê - 2005.

20- Gelek gotar û lêkolînên zimanzanan ên ku di gelek kovar û malperên kurdî de hatine belav kirin.

NAVEROK

1-Çend gotin..... 5
2-Waneya yekê (hêmanên zimên)..... 7
3-Waneya dudiyan (tîp-tîpên dengdêr)..... 9
4-Waneya sisiyan(taybetmendiya tîpên dengdêr)..... 13
5-Waneya çaran (tîpên dengdar)..... 19
6-Waneya pêncan (pevguherîna dengdaran)..... 23
7-Waneya şeşan (hûrnivîs û girnivîs)..... 29
8-Waneya heftan (pevdeng)..... 32
9-Waneya heştan (tîpên cêwî)..... 35
10-Waneya nehan (tîpên dubarekirî)..... 37
11-Waneya dehan (tîpên girêkok)..... 40
12-Waneya yazdehan (girêkokên peyvan)..... 44
13-Waneya duwazdehan Lipeyhevhetina dengdêran..... 46
14-Waneya sêzdehan (êxistin û kurtebiriya tîpan)..... 48
15-Waneya çardehan (kît)..... 52
16-Waneya pazdehan (peyv)..... 55
17-Waneya şazdehan (peyv li gorî çêbûna xwe)..... 59
18-Waneya hefdehan (peyvên hevedudanî)..... 67
19-Waneya heşdehan(hevok)..... 72
20-Ferhengok 77
21-Çavkanî..... 8(

ji weşanên SZK-Rojava

Ji Weşanên
Saziya Zimanê Kurdî li Rojavayê Kurdistanê
SZK – Rojava
(1)